

R: 3

Neştergeriya Yasaya Bîngêhîn û kurd



R: 5

Hilkêş - dakêşa pêwendiyên navbera Tehran - DYA




R: 7

Radîkaltirîn hikûmeta Îsraîl



R: 11

Sirgûn û Wêjeya Kurdî



Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 183
20'ê Gulana 2012'an
Buha: 150 Tûmen

Agirî

Pîroz be 7'mîn salvegera avabûna Tîşk Tv

Şeş salan berî niha, li 3'ê Cozerdana 1385'an de Tîşk tv tevî karwanê ragihandina kurdî bû. Ava bûna Tîşk Tv nuqte guhertinek girîng bû li dîroka xebata gelê kurd û PDK Îranê de.

Bi vê boneyê ve em weke desteya weşana Agirî, pîrozbahiyê ji gelê kurd û xebatkarên Tîşk Tv dikin û hêviya berdehamî û serketinê jêre dixwazin.

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Na bo tifaqa bi rejîma piştevanê terorîzmê re!



Civata Nûnerên Kongireya Amerîkayê biryarnamê xist ber bas, ku tê gotin armanca wê girêdana destên Serkomarê Amerîkayê di warê pêkanîna pêwendiyên bi Îranê re ye.

Di biryarnamê de weke welatê piştevanê terorîzmê û çêkerê

bombeya etomê bas ji Îranê hatiye kirin û daxwaz ji Serkomar jî hatiye kirin, ku Îranek xwedî çekên etomî nabe hebe.

Di beşek din ji biryarnamê de daxwaz ji serkomar hatiye kirin ku mî divêt bi her siyasetek ku li hember metirsiya rejîmê de tenê

pişt bi dorpêç û ragirtin (mehar)ê bike, dijberiyê pêre bike.

Li hemberî vê biryarnamê de ku bi piraniya dangan hat pesend kirin, Komara Îslamî nîgeraniya xwe anî ziman û ew yek bi biryarnamê xerxwazane li dijî xwe da zanîn.

Beşar Qesab! Şîreta Firansva Oland kir! Bi berjewendiya Firansiyan bifikire!!! R: 2



Potîn: Nîgeranê etoma Îranê nebin, Îsraîl dê çareser bike! R: 2



Sergotar

Belûçistan û doma tepeseriyê

Selîm Zencîrî

Wa serê çend rojane ku Parêzgeha Belûçistan bûye qada nêrnamî, şer û pevçûnan li navbera xelk û desthilatê. Nêrnamiyek ku piştî kuştina Molewî Mistefa Cengî, pêşnimêjê bajarokê Rask (şer bi parêzgeha Belûçistanê) ku hevdem fermanerek hêza besic li wê deverê de bûyederketiye holê. Rewşek ku derfetê dide rejîmê ku bi keyfa dilê xwe serkût bike, bigre, bikuje û deverê jî mîlîtarîzetir bike.

Serbarê wê ku Cundulahê berpirsatiya kuştina wî girtiye stûyê xwe, lê rejîmê bi dehan kes ji mamostayên ayînî ên Sune meseb û şaromendên Belûç bi tometa dest hebûn li wê kuştinê de destbiser kirine û ji riya givaş û îşkenceyan ve, girtiyan neçar bi îtirafên direvîn û nîmayişî li Televîzyonan de dike bona vê ku weha bide nîşandan ku destê derekî li van nêrnamiyên de heye, û bikare bigehe armancên weşartî ên xwe; ku yek ji wan kundirol û modîriyeta qutabxaneyên dînî û mizgevtên Suniyan e li piratîkê de. Ya din jî heyf û tohildan ji Erebsitan û Behrîne, piştî derketina aloziyên vê dawiyê li navbera wan de. Wate dixwaze bi teyîsandina şerê mesebî, Suneyan bike goriyê şerê siyasî- mesebî û deverî ê xwe.

Li vê çarçoveyê de gelek malper û medyayên tundrew û radîkal ên xwe, weke Zahidan press besic kirine ku agirê şerê mesebî xurt bikin û li dijî Suneyan piropagandeyan dikin. Bêguman zirarên meşandina siyasetek weha dê berfireh bin. Lewre erkê her kes û aliyekê ye ku li hember vê serkut, pîlan û fitneya rejîmê de bêdeng û xemsar nebin. Bi taybetî medya divê rolê xwe li pûçkirina vê siyasetê de bilîzin. Her çend ku heya niha core bêdengî yan xemsariyek li vê derheqê de dixuye.

Peyama Mistefa Hicrî bo Emîndarê Giştî yê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê

Bi boneya hîlbijartina birêz "Mihemed Ferec" wekî Emîndarê Giştî yê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê, birêz "Mistefa Hicrî" Sekreterê Giştî yê PDK Îranê peyamek pîrozbahiyê pêşkêşî navbirî kir ku eva jêrîn deqa wê ye.

Birêz Emîndarê Giştî yê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê! silav û hurmet!

Bi boneya hîlbijartina we yê birêz wekî Emîndarê Giştî yê Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê di 6'mîn kongireya partiya we de, germtirîn

pîrozbahiyê ji we û di riya we de jî pêşkêşî hemû endamên rêberî ên hîlbijartî di wê kongireyê de dikim.

Hêvî dikim ku Yekgirtû li jêr rênimayî û birêveberiya we de di warê pîrsa netewî û nermrewiya siyasî ku heya niha rêbaza pesendkirîye Yekgirtûya Îslamî bûye her wa çalak be. Hêviya me serkevtina we ye di erkê girîng de û di vê qonaxa hestiyar a bi ser Kurdistanê re derbas dibe.

**PDK Îranê
Sekreterê Giştî
Mistefa Hicrî
5'ê Gulana 2012'an**



Potîn:

Nîgeranê etoma Îranê nebin, Îsraîl dê çareser bike!

Serokwezîrê berê yê Îspaniyayê ragehand ku di civînekê de ku serokên hin welatan têde beşdar bûn, Serokwezîrê Rûsiyê Potîn hat bal min, û di guhê min de got;

Bêhna te fireh be, û emê bikarin her tiştêkê bifiroşin dewleta Îranê û nîgeranê çeka etomiya Îranê jî nebe, çûnkî Îsraîl di dawiyê de, pîrsa etomiya Îranê wê çareser bike.

Xozê Mariya Eznar di doma gotinên xwe de gotûbêjên Bexdayê weke derfeta herî dawî ya bi Tehranê da zanîn û daxwaz ji Îranê kir ku dest ji mehandina Uraniyomê bikişîne û herweha Uraniyoma mehandî jî, jinav bibe.

Beşar şîreta Firansva Oland dike! Bi berjewendiya Firansiyan bifikire!

Li gorî nivîsa rojnameya Waşington post li jêr biryar û rênimayiyên Amerika de welatên Kendawê ên Sunnî meseb çek û teqemeniyên ji neyarên Beşar Esed re dişînin.

Rojnameya Îsraîlî ya Haarits jî bilav kir ku eşkerekirina vê mijarê di rastî de tê wateya şandina mesajek tund ji hikumeta ranê re. Jiber ku heke rejîma Beşar ya niha bê hiloşandin, êdî ne tenê zincîra stratejîk ya rejîma Tehranê ji Îraq

heya Lubnanê wê ji dest herin, belku ew yek wê bibe sedema dilgermiya neyarên rejîma Îranê.

Ew yek mesajek ji Xamineyî re ye da ku bizane bazineya zext û givaşan her ku diçe tengtir dibe û divêt ew dest ji programa xwe ya navîkî hilgirin, û hizra pêkanîna eniyekî Şîe bi rêberiya rejîma xwe ji mejiyê xwe de derxin.

Hişikbûna Gola Urmîyê gefek micid e li ser canê milyonan kesan!!

Cîgirê serokê Komisyona Civakî a Parlamentoya Komara Îslamî ragehand ku, hekî Gola Urmîyê hişik bibe, wê xwê di herêmê de bilav bibe, paşan jî li riya ba û bahozan ve, wê hemû Îranê bixe bin bandora xwe, û di encamê de canê bi milyonan kesî dê bikeve nava tehlûkeyê de.



Mêhdî Îsazade herweha ragehand ku hekî em niha di hizra çareseriyê pîrsa gola Urmîyê de nebin, gelek nakêşe ku akinciyên gund û bejarên derdora golê, dê ber bi bajarên din ên Îranê ve koç bikin, û di encamê de jî nerazîbûnên cîhanî wê lê bikevin.

Alîkariya Amerîkayê bi neyarên Esed re mesajek e ji bo Îranê

Dezgehên ewlehiya Mîsrê sê kesên ser bi rejîma Îranê destbiser kirin, ku li cem wan belgeyek derbarê pîlana revandina balyozê Erebestana Seûdî hate dîtin.

Şêvirmendê Hiqûqî yê balyozxaneyê Erebestanê li bajarê Qahire eşkere kir ku, pîlana revandina balyoz û Nûnerê Erebestanê di Yekîtîya Erebe de hate pûçkirin ku ji aliyê girûpeke ser bi Îranê ve hatibû darêtin.

Cemaledîn Şêvirmendê Hiqûqî yê balyozxaneyê Erebestanê li bajarê Qahire de got ku balyozxaneyê Erebestanê û herweha Konsulgeriyên Erebestanê li bajarên Eskenderîye û Soêzê, seba gefên ewlehiyê ên micid û nîgeranî ji terora balyozê Erebestanê hatine daxistin.



Rejîma Îranê çend kesên din jî îdam kirin

Dezgeha dadweriya rejîma Îranê deh kesên din jî li Kirmaşan û Erdebîlê de bi tawana qaçaxa maddeyên hişber îdam kirin.

Eva di demê de bû ku hefteya berî wan îdamên, 9 kesên din jî hukmê bidarvekirina wan birêve çûbû.

Ji aliyek din ve Çalakên Mafê Mirovan ragehandin ku roja 28'ê Banemerê 16 kes li girtîgeha nawendî ya Yezdê de hatin bidarvekirin ku di nav wan de çar jin û pênc hemwelatîyên Efxanî hebûn.

Hêjayî basê ye ku malbata yek ji wan Efxaniyan tenê seba wêku navbirî nasnameya wî tunebûye, nekarîne bo cara dawiyê berî îdamê wî bibînin.

Amerîka daxwaz ji Japonê kir dest bi ser perê Îranê de bigre

Dadgeheke Amerîkayê daxwaz ji bankek herî mezin ya Japonê kir ku dest bi ser 2 milyar û 600 milyon dolarî ji perê Îranê de bigre, ji ber ku rejîma Îranê dest di êrîşa terorîstî ya sala 1983'an li binkeyekî leşkerî yê Amerîka li Beyrotê de hebû.

Li gorî nûçegihaniya "Jiji" a Japonî, wê bankê jî daxwaz ji dozgeriya Amerîkayê kiriye ku pêdeçûnê bi ser vê biryarê de bike.

Li bûyera terorîstî ya 23'ê Oktobera sala 1983'an li binkeyeke leşkeriyên Amerîkayê li Beyrotê 241 leşkerên Amerîkayî hatin kuştin.

Her wê demê li kiryarek din ya terorîstî di binkeyek leşkerên Feransewî li Beyrotê de 58 kesên canê xwe ji dest dan.

Di sala 2007'an de dadgeheke Amerîkayî dewleta Îranê bi dana 2 milyar û 650 hezar dolar wek xeramet bi malbatên kuştîyan mehkum kir.

Neştergeriya Yasaya Bingehîn û kurd



Niha carek din derfetek dîrokî derketiye pêşberî partiya desthilatdar a AKP'ê, bona wê ku siyasetên xwe ên aştiyane bibe pêş, bi taybetî ku niha bas ji sîstema serokatîyê ji bo Turkiyê dike û li vê çarçoveyê de ji hewce dike ku carek din piştevanî û baweriya kurdan bide bixe, lewre divêt ew jî vê carê soz û durûşmên xwe li yasayê de bixe warê piratîkî û li vê ceribandina destûrî de biselîmîne ku Kurd û Turk hawta ne û Turkiya jî, ya hemû hevvelatîyên Turkiyê ye bi bê cudahiye ayînî, mesebî, netewî, zimanî û ...hwd



Selîm Zencîrî

Piştî derbasbûna sê dehsalan bi ser kûdetaya leşkerî (1982) û sebandina yasayek nîzami û nedemokratîk bi ser civaka Turkiyê de, mijara guherandina vê yasayê niha ji aliyê Partiya desthilatdar a AKP'ê ve ketiye rojevê.

Ji ber ku ew yasa, ne bersivderê xwast û daxwaziyên serdem e, ne jî rengveda hemû tex û qat û pêkhatiyên civaka Turkiyê ye û bûye çavkaniya gelek bêbextî û neewlehiyên siyasî, aborî û civakî li wî welatî de.

Di vê çarçoveyê de piştî hilibijartina 12'ê Hezîrana sala borî, pêngavek piratîkî jêre hat avêtin ku ew jî avakirina komîsyonek taybetî li meclîsê de ye bona pêdeçûn û darêtina ser ji nû ve ya yasayê; helbet bi beşdariya her çar partiyên

sereke li Parlemenê û bi serperestiya raserast a serokê Meclîsê (Cemil Çiçek).

Komîsyona navhatî li midehê heft mehan de serbarê berhevdan û nirxandina destûra 60 welatan, herweha komkirina ra û nêrîna karnasên yasayî, partiyên siyasî û hevvelatîyên Turkiyê li stû bûye. Komîsyona han ragihandiye ku piroje û pêşniyaza 14 partiyên siyasî, 21 zanîngeh, 39 yekêti û rêxistinên pispor, 79 nawendên medenî li pêxem yasaya nû de standiye.

Helbet karê vê komîsyonê li 1'ê Gulana 2012'an de derbasî qonaxek nû bû ku divêt li midehek diyarîkirî de reşnivîsa yasaya nû pêşkêşî parlamatoyê bike û piştî nirxandin û pesend kirina wê ji aliyê meclîsê ve, dê bikewe ber rapirsîn û referandomê û li egera serketina wê de dê bibe cihgirê yasaya niha.

Niha pîrsa eslî ev e ku raya giştî a Turkiyê, partên opozîsyonê û parta desthilatdar çiqas micid û xwaziyarê guherandina vê gotar û dîskorsa nîzami ne bo lojîk û yasayek sivil û aştxwazane; Yan eva ku her yek ji wan aliyan çiqas amade ne ku hezîne û nîrxê jêre bidin û dev ji pawanxwazî û hesta şovenî a xwe ber bidin ku ew jî carê nerohn e.

Lê eva ku li hember de hêvî, xwast û

tekoşînek li rojevê de ye bona anîne rojeva yasayek nû û serdemiyane ku rengvedana nasnameyên cur bi cur û yek ji wan jî kurdan be, tu gumanek li holê de nîne; lê çiqas digunce û li vê hêlê de wê bi ser bikewe, bi baldan bi biyavê dîrokî, karaktera dewletê, piskolojî û derûnnasiya faşîstan û dijberiya partiyên nasyonalîst û şovenîst, nabe carê em gelek hêvîdar û geşbîn bin û wêna û dîmenê çareseriya hemû pîrsgrêkan û Turkiyayek demokratîk raxin berçavan. Çunku hin fayl û pîrsên hestiyar li Turkiyê de hene ku heya niha jî bibe û tabo ne, yek ji wan jî doza kurd e û li midehê sedsala borî de her hewlek ji bo înkâr, helandin û asimîle kirina wê hatiye bikar anîn. Dewleta Turkiyê jî ku li ser bingeha yek netewe, yek ziman, yek xak û yek ol hatiye îdare kirin, ne tenê serketî nebûye û Turkiyê pêş nexistiye, belkî derbên giran û karîger jî ji peykerê wî welatî li warê hiqûqî, siyasî, aborî û civakî daye, lewre hêz û katalîzorek bihêz dixwaze heya ku vê eqliyet û zîhniyeta pawanxwaz û mîlîtarîstî biguherîne ku ew yek jî bi tena serê kurdan nahê kirin.

Eva ku vir de girîng e, serbarê îrade, vîn û pêdagiriya partiya desthilatdar ji bo bihêz û berfireh kirina demokrasîyê li Turkiyê de, yekîti, yekrêzî, kar û xebata hevbeş û aştiyane û berdewam a karakterê kurd û hêzên siyasî yên wê ye ku "sengê mehek" e ku çiqas dikarin şûndaner û karîger bin li ser cihdana maf û daxwaziyên xwe li destûra nû de. Her çend ku piroje û pêşniyazên hevbeş pêşkêşî komîsyê kirine ku bi fermî nasîna zimanê kurdî û nasnameya kurd, kakil û hêvênê eslî e wê pêk tîne û BDP'ê jî eva weke hêla sor a partiya xwe li Parlimentoyê de destnîşan kiriye ku jêderbasbûn yan piştguh xistina wê, tê wê wateyê ku destûra nû tesîr û karkirdek wusa bo kurdan nabe.

Niha ku Yasaya Turkiyê li hemberî neştergerî û operasyonê mezî de ye û bona wê ku Turkiya ji wan nesaxiyên kuşinde rizgar bibe, hewce ye çavkaniya ferq û cudahiyan, rohê mîlît arîstî û hesta şovenîstiyê li yasaya nû de bihê kuştin û norm û pîvanên yeksanî û hevbeşî li maf û berpirsatiyê têde reng vedin; heya ku her kes li jêr sîbera wê de hest bi bextewerî û dadpeweriyê bike û li heman de jî xwe bi berpirsiyar bizane. Berevaj, çaresera demkî û rûkeşiyane wê kirîzan kûrtir û aloztir bike.

Niha carek din derfetek dîrokî derketiye pêşberî partiya desthilatdar a AKP'ê bona wê ku siyasetên xwe ên aştiyane bibe pêş, bi taybetî ku niha bas ji sîstema serokatîyê ji bo Turkiyê dike û li vê çarçoveyê de jî hewce dike ku carek din piştevanî û baweriya kurdan bide bixe, lewre divêt vê carê soz û durûşmên xwe li yasayê de bixe warê piratîkî û li vê ceribandina destûrî de biselîmîne ku Kurd û Turk hawta ne û Turkiya jî, ya hemû hevvelatîyên Turkiyê ye bi bê cudahiye ayînî, mesebî, netewî, zimanî û ...hwd.

Herçiqas ku axaftinên vê dawiyê ên serokwezîr li dor zimanê kurdî ku da zanîn tenê dikare bibe dîrsa hilibijartî, yan eva ku berpirsek partiya wî jî zimanê 20 mîlyon kurdan bi zimanê neşarîstanî û xeyre perwerdehiyê da zanîn, hinekê gumanan dixe ser hêviyên li dor lêbrawî, îrade û xwasteka ji dil û micid a hikûmetê bo çareser kirina yekcarî a pîrsa kurd û pîrsên din ên Turkiyê pêka destûrê. Lê egera wê çendê jî zor e ku pîroseya han li her awayî de bi qazanca berfireh bûna sînorê demokrasîyê û mafê şaromendan û takekesan be ku dîsan jî hewce dike bona gavên wusa jî, kurd hevkar û alîkarekî hişyar û serwest bin.

Serokwezîrê berê yê Firansayê bû Wezîrê karê derve yê Firansayê

Loran Faybos ê 65 Salî, ji aliyê Firansiwa Olanda ê Serkomarê Firansayê ve wekî Wezîrê karê Derve hat hilibijartin.

Navbirî bi regez Cihû ye û yek ji dostên welatê Îsraîlê ye. Di dewrana Serokwezîriya xwe de, di dehika 90'î de, gelaleyek pejirand ku li gorî wê, her kes Holokastê înkâr bike, wê cezayê salek

zîndanê bi ser de bê sebandin.

Faybos yek ji alîgirên herifandina rejîma Beşar Esed e, û heya niha di gelek civînên dijberên Esed de beşdarî kiriye.





Îrade û hevbendiya neteweyî piştî 19ê Banemerê ket rojevê



Azad Kurdî

Darvekirina pênc girtiyên siyasî ku 4 jê kurd bûn, du saliya xwe jî bihorand. Lê wê bûyerê bandorên mezin kirin ser civaka siyasî û sîvîl a Rojhilatê Kurdistanê û tevgera azadîxwaziya Kurdistanê û destkevtê mezin li pey xwe bi cîh hişt. Di 9'ê Gulana 2010'an de, Ferzad Kemanger, Şîrîn Elemholî, Ferhad Wekîlî, Elî Heyderiyân û Ferhad Îslamiyan hatin darvekirin.

Ew biryar ne dadpewerane û ne hiqûqî bû, ji ber ku ew girtiyên siyasî tenê bi sebebê raman û tevgerên xwe yen azadîxwaziye bi wî cezayê giran re rûbirû bûn, mafê wan girtiyên siyasî ne darvekirin bû, ger sîstema cezayên îslamî yê Komara Îslamî nebûyana, jiyana wan azadîxwazan wisa bi hêsanî nedihat standin. Ji ber ku ew girtî di dadgehên çend deqîqeyî de bi cezayê giran ê darvekirinê hatin mehkûmkirin, bêy tu belgeyek eşkere hebe ku wan kiryarek metirsîdar kiribe. Guneha wan kurdbûn û xebat di rêya azadî, demokrasî, aştî û mafên neteweyî bû. Ferzad mamosteyê dibistanê, rojnameyan û çalakvanê sîvîl bû. Parêzerên wan girtiyân û mafnas bawer in ku proseya doza wan şoreşgerên kurd dîrî çarçoveya hemû pîvan û bingehên mafê mirov û qanûnên navneteweyî hat rêvebirin.

Piştî lidarvekirina wan girtiyên siyasî, nerazîbûnên giştî li dijî vê kiryara rejîma desthilatdar li Îranê di asta navxwe û navnetewî de da

destpê kirin û heta niha jî ji rojevê ne derketiye.

Herçiqas ji destdana van şehîdan ji bo Kurdistanê derbeyek giran bû, lê şehîdbûna Ferzad Kemanger û hevalên wî civaka Kurdistanê bêhtir ji caran hişyar kir û rabûnek nû hat heştêkirin. Ji xeynî vê yekê, bo yekemîn car hemû partiyên siyasî, çar roj piştî darvekirina wan girtiyên siyasî, gireva seranserî li Rojhilatê Kurdistanê ragehandin. Nerazîbûnek sîvîl a berfireh ku heta wê demê bê mînak bû. Ev yek pêngavek neteweyî di navxweyê Kurdistanê de anî holê. Her eva bû ku karbidestên Komara Îslamî heta niha jî ligel be, termê wan girtiyân radestî malbatên wan nekirine û heta kes nizane ku li kuderê hatine veşartin!

Gireva seranserî li 23ê Gulanê û çar roj piştî îdamkirina wan koma girtiyên siyasî Rojhilatê Kurdistanê û parçeyên din jî hejand. Yekîti, hevdengî, tebahî û hevxebatî mifteya serkevtin û pêşveçûna hemû çalakî û xebatên siyasî, civakî û çandî ye. Bi taybet ji bo hêzên siyasî ku xwedî helwest û raman û armancên cuda yên siyasî bin. Lê 19ê Gulanê hemû hêzên qada tevgera azadîxwaziya kurd li Rojhilatê Kurdistanê anîn ba hev û gihîjandin vê bawerê ku bi yekdem, yekhelwest û tebahî greva sîvîl û giştî rabîgehînin û bi vî awayî nerazîbûna xwe li hemberî vê kiryara desthilatê nîşan bidin. Karek ku ceribandina wê destkevtên dîrokî li pey xwe hiştin û pêdivî ye ku Kurdistan bi van çalakiyan bêhtir hêz û îradeya xwe ya hişyar û rabûyî derbixe holê.

Di rastî de hemû civatên xelkê Kurdistanê bi germî bersiva vê îrada yekgirtî ya hêzên siyasî dan û tirs û xofek mezin xiste nav dilê Komara Îslamî. Hêvî xurttir bûn û bi vê yekê civat û hêz û aliyên siyasî pirr baş gihîştin hev. Ji xwe mêjdem bû ku ew yek ji hêzên nav tevgera kurd dihat çaverêkirin. Loma li 19ê Gulanê darvekirina wan 4 girtiyên siyasî û ramanê li Kurdistanê îrade û hevalbendiya neteweyî zêde xurt kir.

Niqurçk

Mela bêt? bila bêt!!!!



Ceifer Mubeşirniya

Nasir Neqûyan ji melayên deng û rengê Rejîma Îranê

got: Hicab mîna Kadoyê ye, çawa kado tenê bi destên xwediyê wê ve tê vekirin, gerek hicab jî tenê li bal xwediyê xwe bihê vekirin!!!



Lêêêê her çiqas ez dinêrim û difikirim, di vê dinyaya pan û fireh de tenê li Îranê kadoyên şexsî ên xelkê tîn vekirin, telefonên mobailan tîn gerîn û zewtkirin, bi çekmeyan diçin ser malên xelkê.

Encama hicaba di Îranê de jî bû ev ku tenê di dinyayê de Îranê serî ji welatan standiye ji bo bêexlaqî û fesadê. Jin muitad dibin û dikevin telika leşfiroşiyê, lê dema derbikewin ber derî, divêt hicaba xwe gor dilê melayên rejîmê biparêzin.

Neku çawa mela xwe bi emînê malê xelkê dizanin û malên şexsî ên xelkê digerin û di xalên gerînê de kadoyên xelkê vedikin, her bi wî awayî jî xwe bi emînê namûsa xelkê bizanin û li gor futwaya mela "Nasir" ji hicaba keç û jinên xelkê xwedî derkevin û vêca li ser îzna yezdanê mezin hicaba wan vekin û bi tevlihevkrina rast û çepan ji xwe re bi helal bizanin û bikevin ser kadoya xelkê û patika wan bigezin mîna hêstirên şemboz ên zivistanan qelew dibin, heya bi şenan nesikitînin, bernedin.

Eva ka haleeee!! eva ka rewş eeee hey bo xatra xwedê!!!

Mehmûd bêt? Pîz ken bila bêt

Hesen Rohanî di pirtûka xwe de dibêje, Mehmûd pirsî ku çima Ajansa Navnetewî a Enerjiya Navikî dixwaze civîna bilez li ser me pêk bîne? Wî jî gotibû piraniya welatên endam di Ajansê de li jêr hejmûniya Amerîka û Ewropayîyan de ne û beşa zêde a xerca ajansê jî ew didin.

Mehmûd gotibû xerca ajansê çend e? Hesen Rohanî bersiv dabû ku nizamim lê çend sed milyon dolarek in.

Mehmûd jî gotibû telefonêkê ji Mihemed Elberadî re bikin û bêjnê ku gişt xerca ajansê emê bidin, lê bila wê yekê derheq me nekin!!!!

Mehmûd canê, wusan nabe, te mencelek mastê pez û pîstikek jaiyê zozanên Cêrme û Bêtkaran jî ji xêzana Elberadî re bibira, belkî îzna te daba ku te bombeya navikî çêbikiriba û aliyek dinyayê teyê pê herifandiba!.

Kuro xolibser, min danî tu pismamê Elberadî, ne babo tu birayê wî, be tu wê çî ji "Yokya Amano" bikî ku mîna dîkên larî rabûye se çimên xwe û tu jî mîna mirîşka hêka wê tê nizanê xwe bikî kîjan kunê de nefesek rihet bikêşî, xudanê jajî.





Hilkêş - dakêşa pêwendiyên navbera Tehran - Washington (beşa dawî)

Çavkaniya serekeye arîşeyên di navbera Amerîka û Îranê de îdeolojiyên fermiye her

du aliyan e ku bi eşkere li dijî hevîn û yek ji wan hebûn û pêşveçûna xwe di nebûn u paşveçûna ya din de dibîne. Amerîka bi lîberalîzma siyasî û abûrî, bawerîya bi destvernedana dewletê di jiyana taybete kesan de, azadiya Olî, parastina mafê tak û serbestiya bê sînûre mirovan (her nebe bi awayê fermî û li gor Yasaya Bingehîn e welat) bûye sembola sîstema sermayedariyê. Komara Îslamiye Îranê bi destverdana di jiyana hemû kes u komên civakê de, serdest kirina siya îdeolojiya xwe ya olî bi ser hemû bawerîyan de, vegeşandina hestên tolhildan û dijberîya bi Amerîka re dikeve xala himberanî wê îdeolojiyê. Eger Amerîka bi hêza xwe ya leşkerî û abûrî bixwaze serdestiya xwe bi ser beşek ji cîhanê biparêze, Îran bi hewlên ji bo dersînûr kirina îdeolojiya dijî Amerîkayê bûye astenga serekeye li ber pozê Washingtonê.

Dijberîya ku li ser bingeha cudahiya îdeolojîk hatiye ava kirin bi rengên cuda û her carê bi awayekê xwe nîşan dide. Hêcet zorin, lê hêcetên ku weke faktorên siyasî ji bo berdewam kirina dijberîya navbera her du aliyan de têne bi kar anîn piranî xwe dispêrin wan arîşeyan ku piştî sala 1979 li dema destpêka jiyana Komara Îslamî di navbera her du aliyan de serî hildan. Ji wê demê ve heya niha her arîşe û aloziyek ku di navbera her du welatan de serî hildabe, bi awayekê xwe dispêre wan nakokîyan ku piştî hatine ser kara Komara Îslamî destpê kirin.

Pêgava yekêye rêjîma Komara Îslamî piştî destpêka jiyana xwe li sala 1979 tûj kirina hestên dijî Amerîka û hevpeymanî serkeye wî welatî li cîhanê, Îsraîlê bû. Ev dijberî bi hin helwestên Amerîkayê li hember rêjîma nû ya Tehranê û parastina karbidestên payebilinde rêjîma Şah derbasî dijminayetiyeke bê sînûr bû ku niha piştî 32 salan hê dikele u weke tê xuya kirin, carê wê dawî jê re tune be. Xumeynî beriya ku deselatê bigre dest, Amerîka weke piştewanê serekeye Şah u bi wî awayî weke dijminê xwe yê sereke nîşan da



Ebdulla Hicab

û berê gef û dijberîya xwe ya îdeolojîk da Washingtonê.

Şah beriya ku sala 1979 li Îranê bireve, bi miliyaran pareyê nefta Îranê li bank u navendên abûrî û bazirganiye Amerîkayê bi cî kiribûn. Dema rêjîma Îranê guherî, rêjîma nû bi gefan daxwaza wî diravî kir, lê Amerîkayê ne tenê ew dirav paş ve nevegerand, belkû dest danî ser û bi wî awayî rê neda ku rêjîma nû wî diravî paş ve bizivirîne Îranê an ji bo berjewendiyên xwe li derveyî welat bi kar bîne. Ji wê demê ve ew dirav bû mijarek girîngê ciyê netifaqiyê di navbera her du aliyan de. Îran îdia dike ku sermayeya Îranê ku Amerîka piştî sala 1979 dest danî ser ji 10 miliyaran dolaran pitir e. Li gor Amerîkayê beşa herî zore wî diravî di dema arîşeya Balyozxaneyê Amerîka u di encama li hevhatina di navbera birveberîya Reagan û Komara Îslami li ser serbestberdana dîplomatên Amerîkayî li Îranê derbasî Îranê bû û êdî ev mijar di rojevê derdikeve. Îran wê dosyayê hê vekirî dizane û DYA tawanbar dike ku bi neheqî dest daniye ser heyiya Îranê.

Komara Îslamî ji nêzîkbûna Amerîkayê ji bo guhertinên siyasiye herêma Rojhilata Navîn jî pir aciz e. Di gel ku Amerîkayê bi ji navbirina du rêjîmên dijberî Îranê; Taliban li Efxanistan û Rêjîma Baes li Îraqê alîkariyek mezin da Komara Îslamî u di rastiye de temenê jiyana Komara Îslamî dirêjtir kir, lê rêjîma Komara Îslamî li bendê bû ku Amerîka hema piştî guherîna wan rêjîman li herêma paşve bikişê. Hebûna hêzên leşkerîye Amerîka li rojhilat û rojava ya Îranê, wê dudiliyê ji karbidestên Komara Îslamî re çê dike ku neke gelên Îranê ji guherîna rewşa siyasiye heremê hêz bigrin û bi wî awayî serhildanek berbelav destpê bikin. Ev kabûsa ku rêjîm jê ditirse,

bi amadebûna leşkerê Amerîka li welatên Kendavê hê pirtir Tehranê ditirsîne.

Di heman demê de dorpeçên abûriye ku bi pêşengî u navtêdana Amerîkayê niha ji her demê pitir karîgerî li ser abûriya Îranê daniye, mijarek dine ciyê netifaqiyê di navbera her du aliyan de ye. Her çend Îran îdeaya hindê bike ku zêde guh nade wan dorpeçan û heya niha bi rihetî xwe ji bandora wê siyasetê parastiye, lê binesaziya abûriye Îranê bi awayekê cidî ketiye bin bandora wan dorpeçan. Bi awayekê ku eger ji ber firotina neftê û dahata bilinde Îranê ji wê riyê ve nebaya, wê niha ji mêjve bûya ku Komara Îslamî biketa qeyranek kûr. Ew siyaset weke yek ji astengiyên herî xurt û bi bandore li ser riya pêwendiyên navbera Tehran û Washingtonê tê zanîn.

Îran li hember wê siyasetê Amerîkayê, eger nekare zextê li Washingtonê bike, hemû derfet û îmkânên xwe li dijî Îsraîlê bi kar tîne. Ji bo Îranê ew dijberî hem tê maneya pêşvebirina îdeolojiya Xumeynî û hem jî di heman demê de serêsiyeye ku bi awayê eşkere Amerîkayê aciz dike. Siyasetê Îranê li dijî Îsraîlê û berjewendiyên wê di asta cîhanî de, bi tenê bi piştgirîya Îranê ji bo Hizbullah, Cehada Îslamî û Hamasê re sînûrdar nabe. Li her devera cîhanê ku tora îstixbaratî u îmkânên leşkerîye Îranê hebin, li dijî berjewendî û siyasetê Îsraîlê tê bikar anîn. Ew zêdegavî dema bi gefên aşkereye karbidestên Tehranê li dijî Îsraîlê re têkel dibin, ji bo Amerîka, weke piştewan û parêzerê serkeye Îsraîlê, dibe giriftariyek mezin.

Serêsiya Amerîkayê bi tenê ew zehmetî nînin ku Komara Îslamî ji bo Îsraîlê û hevpeymanên dine Amerîka li Rojhilata Navîn pêk tîne. Îran li Afrîqa, li Amerîka Latîn, li Asya dûr û Navîn, li Qefqasya û li Balkanan jî li hember hemû wan pêvajoyên siyasiye ku Amerîka û Rojava dixwazin bi pêş bixin disekine û ya ku destan bê dike heya astengiyên dayne ser riya wan pêvajoyên siyasiye. Ew serêşî carna Amerîkayê tîne ser wê baweriyê ku di gel hemû wan sûdên ku hebûna rêjîmek weke ya komara Îslamî ji bo berjewendiyên

wê yên stratêjîk dikare pêk bîne, lê dîsan jî nebûna wê rêjîme bi ser hebûna wê de tercîh bike.

Pêvajoya guhertinên siyasiye ku li welatên Erebe destpê kiriye û niha derbasî Sûriyê bûye jî yek ji xalên nakokîya navbera Îran û Amerîkayê ne. Li Misr, Lîbiya, Tûnis û Yemen Îran dixwaze bi navtêdana grûpên şe, reng û rûye îdeolojiya xwe bide pêvajoya guhertinên siyasiye. Li welatên Kendavê jî tiliya Îranê di kar de ye heya pêvajoyek siyasiye bin kontrola Tehranê destpê bike. Îraq û Lubnan bi xwe bûne dîvik u dîvajoyên Qum û Tehranê. Niha serhildan ketiye Sûriyê, lê xuya ye ku ev ji bo Komara Îslamî xeta sore. Lewma di serhildana Sûriyê de, Komara Îslamî bi awayek rasterast piştgirîya abûrî, siyasî, çekdarî û lojistik dide rêjîma Esed. Ji wê jî zêdetir Supahê Qudse Komara Îslamî rasterast beşdarî şerê rêjîma Esed li dijî serhildêrên Sûrî dibe. Ew rewş ne bi dilê Amerîka ye.

Bi kurtî cîhana ku Amerîka diparêze û ew pîwan û nirxên ku Amerîka li pey digere, di gel yên ku Komara Îslamî dixwaze û diparêze, ji bingeha xwe re li dijî hevîn. Di rewşek wisan de, projeya navkakiliye Îranê hem serêsiyeye zêdetire bo Amerîka u hem jî derfeteke ku Washington dikare bi wê hêcetê, eger bixwaze hinekê dev û difina Melayên Îranê pê mizde. Lê hem Washington û hem jî Tehran dizanin ku Îranek bi çekên atomî teyarkirî, wê nekare şiyana xwe li dijî berjewendiyên Amerîka an li dijî Îsraîlê bikar bîne. Supah û artêşa Îran her çî qas xurt bin jî, lê li hember teknolojiya pêşketeye Amerîka û hevpeymanên wê, zehmete ku bikarin bi riya leşkerî serî hildin. Pirsgirêk ewe ku Îrana teyar bi çekên atomî wê parsenga hêzê li herêm û heta li cîhanê jî biguhere û kontrola Amerîka û hevpeymanên wê bi ser zeradxaneyê atomiye beşek zor li cîhanê sînordar bike. Di rewşek wusan de wê zehmet be ku cîhan bikare pêşbirkiya xwe teyarkirina welatên din bi çekên atomî rawestîne. Dema kontrola teknolojiya atomî ji dest dewletan derket û kete destê grûpên dijber, wê demê kabûsa serekeye Amerîka û welatên xwedî bandor di siyasetê cîhanî de zêde dibe.

Hilkêş- dakêşa siyasetê Amerîka li hember Îranê niha ketiye qonaxek aloz û pir hestiyar. Îran niha bi cidî ber bi xwe teyarkirina atomî ve diçe, Amerîka dixwaze pêşiyê lê bigre. Îranê pêwîstî bi demê heye, Amerîka ber bi hilbijartina serokkomariyê ve diçe û pêwîstî bi aramî di siyasetê xwe ya navneteweyî de heye. Di wê navberê de Îsraîl bi dudiliyê mezin çav li riya encamên pêvajoya guftogoyên di navbera Tehran û koma 5+ 1 de ye. Arîşeyên Amerîka û Îranê xuya ye ku wê hê ji gelek kendal û korên din re derbas bibin, lê heya Komara Îslamî li ser kar be bi dawî nayên. Gelo wê Îsraîl heya kengê tehemula wê hilkêş - dakêşê bike, zehmete niha bê pêşbînî kirin.

Geşekirina Nionaziyan û Rastên Tundrew li Ewropa de



Şehab Xalidî

Ew hilbijartinên parlemênî û serkomarî ku li wan dawiyane de li hinek ji welatên Ewropayî ji wan

Feranse, Yonan, Îspanya û ...hwd de birêve çûn, aliyê kê m ew rastiya selimandin ku piraniya xelkê wan welatan ji siyasetên aborî ên welatên xwe nerazî ne û deshilatdarên welatên wan bi sebebkarê pêkhatina kirîzek weha dizanin, lewra jî dengê xwe didne partiyeke derveyî deshilatê, ku ji bo baştirkirina rewşa aborî û rizgarkirina ji kirîza aborî hewleke micid bide.

Xala balkêş û cihê jê hûrbûnê ew e ku di wan hilbijartinan de partiyên rastrew bi hilgirtina druşmên netewexwazî, çareserkirina kirîzên aborî û pêkanîna derfeta kar, dijayetî di gel wergirtina penaberan şiyane ku xelkê zaf li dewra diruşmên xwe kom bikin û li çav hilbijartinên pêşîn dengê zêdetir ê xelkê bidest bînin, ku di rastî de geşekirina ew bîr û hizra netewexwazî û dijî penaberan şirove û lêkdaneweyên cur bi cur jêre tê kirin û bûye cihê nîgeraniya zaf ya biyaniyan li welatên Ewropayî de.

Li welateke wek Feranse de em şahidê vê yekê bûn ku Mariyen Lopin, berbijara partiya "Bereya Netewî" ji bo posta serkomariya Feransê ku nûneratiya rastên tundrew dike, bi bidestxistina %18 ji dangan, li rîza sêyemîn de cih girt. Herçend ku navbirî nekarî li dewra duyemîn de jî beşdar be, lê selimand ku bîrûhizra wî û partiya wî di nav xelkê Feransê de çiqas alîgir hene. Herweha di hilbijartinên parlemênî ên Yûnanê de me dît ku partiya "Kirîsî Awrî" ku ji nionaziyan pêk tê, şiya bi bidestxistina %6 a dangan 19 kursiyên parlamentoyê bi dest bixe, ku ew yek bo yekemîn car di dîroka Yûnanê de ye ku partiyeke Nionazî bikare here

parlementoyê de.

Ji bo selimandina vê rastiyê ku kîjan welatê Ewropayî zêdetir di gel pirsra geşekirina rastên tundrew li astê damezraweyên siyasî bi taybetî parlemênî û dewletan berbirû ye, li wir de emê deqê raporekê raxînin ber çawan ku li malpera kanala Elcezîreyê de hatiye weşandin, ku bi vî awayî ye:

Utrîş: Rastên tundrew xwediyê 55 korsiyên ji korsiyên parlemênîya wî welatî ne ku ew 55 korsî di navbera partiya "Azadî" (bi 34 korsî ji koma 183 korsiyên) û hevalbendiya "bo pêşeroja Utrîşê" (bi 21 korsiyên) hatiye parvekirin ku dibe %22.8 a dangan.

Siwîs: Di vî welatî de "Partiya Xelkê Swîsê" bi rêberiya Tunî Birunêr ku nûneratiya rastên tundrew dike, li hilbijartinên parlemênî ên sala 2011'an de karî 54 korsiyên parlamentoyê ji koma 200 korsiyên bi dest bixe. Ew partî xwediyê bîr û hizreke tundrewane û nivşperwerane ye.

Norwêj: partiya "Kongireya Rastên Tundrew" xwediyê 41 korsiyên ji koma 169 korsiyên parlamentoyê ye ku %23 a dangan pêk tîne. Yek ji endamên vê partiyê Andiryas Patrîk e ku li meha Havîna sala 2011'an gulle bi ser komek ji ciwanên ser bi "Partiya Karkar" de reşand û li encama vê cînayeta navbirî de zêdetir ji sed kesd hatin kuştin û birîndarkirin. Helbet piştî vê cinayetê partiya "Kongireya rastên Tundrew" di hilbijartinên herêmî de di gel şikestek mezin berbirû bû.

Fenland: Partiya "Fenlandiyên Rastîn" ku partiyeke rast a tundrew e, karî li hilbijartinên parlemênî ên meha Nîsana 2011'an de serkevtinek berçav bi dest bixe û ji koma 200 korsiyên parlamentoyê 39 korsiyên ji xwe re bi dest bixe.

Mecarîstan: Partiya "Hevalbendiya Ciwanên Rastrew - tevger bo Mecarîstaneke baştir" (Cobîk) li hilbijartinên



parlementoyê ên Nîsana sala 2010'an de karî bibe xwediyê 46 korsiyên ji koma 386 korsiyên. Ew partiya bas ji nasnameya netewî dike û carna propagandeya nazîsmê jî dike.

Danmark: Rastên Tundrew di vî welatî de piştî destpêgehîştina "Partiya Xelk" li hilbijartinên parlamentoyê ên wî welatî de bi 22 korsiyên ji koma 179 korsiyên parlamentoyê bû bi hêzek di nav rewşa siyasî ya wî welatî de û xwediyê bîr û hizreke dijî wergirtina penaberan e.

Holend: Partiya "Bo Azadî" bi serokatiya Girî Wîldêrz ku partiyeke rast a tundrew e, li hilbijartinên parlemênî ên wî welatî li meha Hezîrana sala 2010'an de karî 24 korsiyên ji koma 150 korsiyên bi dest bixe.

Biljîk: Rastên tundrew di vî welatî de bi serokatiya Partiya "Berjewendiya Fenlandiyên" li hilbijartinên parlemênî ên wî welatî li Hezîrana 2010'an de karî 12 korsiyên ji koma 150 korsiyên parlamentoyê bi dest bixe. Ew partî xwediyê bîr û hizreke neteweyî û cudahîxwazane ye.

Swîd: Rastên tundrew di wî welatî de bo yekemîn car piştî hilbijartinên parlemênî ên meha Septembara sala 2010'an bi serokatiya "Partiya Demokratên

serokatiya "Partiya Demokratên Swîd" rîya wan kete parlamentoyê û şiyar 20 korsiyên ji koma 348 korsiyên bi dest bixin.

Îtalya: Partiya "Peywenda Bakûr" ku partiyeke rast a tundrew e, û hevalbendê dewleta pêşîn a Îtalyayê bi serokatiya Birloskonî bû, dijî wergirtina penaberan e, û li hilbijartinên parlemênî ên sala 2008'an de karî 60 korsiyên parlamentoyê û 25 korsiyên li Senaya Îtalya de bi dest bîne.

Alman: Rastên tundrew û Nionazî bi serokatiya "Partiya neteweyî a demokrat" ku propagandeyê bo sipî pêstan dike, li hinek ji eyaletên wî welatî de karî bo hilbijartinên parlemênî dangan bi dest bixe.

Bi berçavgirtina wan zanyariyan em dikarin bigîjne vê encamê ku heke partiyeke demokratîk û pêşewtî ên welatên Ewropayî nekarin wan kirîzên aborî ku welatê wan dagirtiye çareser bikin, eva bi geşekirina roj bi rojê zêdetir ya rastên tundrew, û renga di pêşerojê de bi bidestvegirtina deshilatê ji aliyê wan ve, ew ne tenê ji vê kirîza aborî rizgar nebin, belku roj bi rojê di gel kirîzên din ên siyasî û civakî jî berbirû bin, û zirar bigîje vê demokrasiya ku ew wek yek ji şanazyên herî mezin ên xwe dihesibînin.

Elçîn Menaf Of : "Emê li Yorovîjinê de Azerbaycanê bikine doje!"

Elçîn Menaf Of, kesatiyê naskirî û Serokê Partiya herî navdar ya Îslamî di Komara Azerbaycanê de, ku ji bo beşdarî di civîna "resaleta cîhanî ya îsalmê" çûbû Îranê, li bajarê Erdebîlê ragehand ku hekî ev rêjeya hemcîns bazan, bê lidar xistin, ewê xwîne di rîya Îslamê de birêjin.

Navbirî tekez kir ku ji bona birêveçûna civîna han dibe li ser termê me re derbas bin, û hekî şerê navxwe jî biqewime, emê Azerbaycanê ji wan re

bikin doje.

Serokê Partiya Îslamî ya Azerbaycanê serbarê rêzgirtina ji piştewaniyên Komara Îslamî got; Îmam Xamineyî ji me re mînak û berjeng e. Her li vê çarçoveyê de li nimêja îna derbasbûyî li Îranê de jî pêşnimêjên ser bi rejîmê bi tundî êrîş kirine ser vê Yorovîjinê û ew yek bi dijî beha û nîrxên îslamê dan zanîn.



Komkujiya Roboskiyê:

"Amerîka pêzanîn dan, Turkiyê jî operasiyên pêk anî"



Her ku diçe derbarê komkujiya Roboskiyê de ku 34 sivîlên Kurd hatibûn kuştin, agahiyên nû derdikevin holê.

Li gor rojnameya Wall Street Journal ku yek ji rojnameyên herî zêde li Emerîka tê firotin, Emerîka pêzanînên îstixbaratî bi rêya balefirên bê pilot ku jêre hatibû veguhastin dane Tirkîyê û Tirkîyê jî bi balefirên xwe komkujiya Roboskiyê pêk aniye. Rojname li ser zimanê berpîrsên Emerîkî dide diyarkirin ku gotine "Ji me re pêzanîn hatin, karwanek siwaran di rê de ye, me jî tenê ew yek ji Tirkîyê re ragihand û me biryara êrîşê bi hêviya wan ve hêla, Tirkîyê jî biryara êrîşê da."

Hêjayî gotinê ye, ji dema komkujiya gundê Roboskiyê ji aliyê balefirên Tirkîyê ve pêk hatî heta niha malbatên kesên ku di vê komkujiyê de jiyana xwe ji dest dane di nava têkoşînê de ne ku kujerên zarokên wan bêne aşkerekirin.

Demîrtaş: Bila Emerîka lêborînê ji Kurdan bixwaze

Li hemberî van zaniyariyan de, hevserokê BDPê, Selahattîn Demîrtaş eşkere kir ku bila Emerîka lêborînê ji kurdan bixwaze û da diyar kirin ku wan di serdana xwe a bo Emerîkayê de mijara komkujiya Roboskiyê anîne rojevê.

Demîrtaş bi rojnamevan Asli Aydintaşbaş re peyivî û got: Me berê jî îfade kir û dizanibû ku îstixbarat ji Emerîkayê tê, jixwe predatorên Tirkîyê tunine. Me nizanibû ew mekanîzma navbera Tirkîyê û Emerîka ku li Enqerê masayek ava kirine. Ew agahiyana tene ser masê. Yê ser masê helbet ne çawuşekî pîspor bû, kesekî payebilind bû û ew efsera helbet tenê biryarê nade. Biryar, heta asta herî jor diçe. Texmîna min ewe ku, wê şevê ji serokwezîr jî pejirandina devîkî hat xwestin. Ji bo vê kes naçe ser bûyerê û hevdu diparêzin.

Demîrtaş got em dixwazin Emerîka bi fermî ji gelê Kurd lêborînê bixwaze. Emê vê daxwaziya xwe bi nameyekê an jî rûbirû ji balyozê Emerîkî jî bixwazin.

Miladîç di Dadgeha Lahe de bi nifişkujiyê hat tawanbarkirin

Ratko Miladîç fermandeyê berê yê artêşa Sîrbên Bosniyê, di Dadgeha Lahe de bi 11 tawanên weke nifişkuji, qetil, teror û cînayeta li dijî mirovatiyê hat mehkûmkirin.

Navbirî karî ji destê dadgehê bireve, lê piştî derbasbûna 16 salan cardin, di gundekê de li Bakûra Bilgiradê hat desteserkirin.

Di dorpêçkirina paytexta Bosniyê de ku heyamê 43 mehan berdewam bû, pitir ji 10 hezar kesî hatin kuştin ku destê Ratko Miladîç di kuştina wan de hebû.

Ji dîtingeha Sîrbên regezperest ve Ratko Miladîç weke qehreman



û ji dîtingeha Musulman û Kirowatan ve jî bi Qesabê Balkan, hatiye naskirin. Herweha navbirî bi rêxistina komkûjiya pitir ji 8 hezar misilmanên sêvîl hatiye tawanbarkirin û, ev komkujiya han bi cînayeta herî hovane piştî şerê dîyemîn ê çihanî li Ewropayê hetiyê naskirin.

Rojev



Nihêrînek bi hevlendiya kadîma Û Natanyaho; Radîkaltirîn hikûmeta Îsraîl

**N: Ferehmend Elîpûr
W: Arîn**

Natanyaho, serokwezîrên Îsraîlê li halekê de dest avête xurt û bihêzkirina kabîneya hevlendiya xwe ku li mehên dawîn de, hikûmeta wî ketibû bin givaşa rexne û lomeyên tund de. Lewre nûçeya tevlihbûna partiya Kadîma, weke mezintirîn parta li nav parlamana Îsraîlê bi kabîneya Natanyaho, serketinek mezine jêre û bersivê e bi rexnegir û dijberên hikûmeta wî ku niha şûn de bi moral û cesûriyek zêdetir ve li hemberî wan de bisekine.

Natanyaho wekî rêberê parta tundajo ya Lîkod, bi hizba nermrew a Kadîma bi rêberiya Şaol Mofaz re hevlendiyek bidest xistin ta ku li rex partiya Îsraîl Bîtna bi rêberiya Awîdigor Lîbirmen û Partiya tundajoya mesêbî a Şas, bi rêberiya Elyaho Yeşay yek ji radîkaltirîn hikûmetên di dîroka Îsraîlê de pêk anî û kabîneyek berfireh û pir alî û bi piştewaniyek xurttir li Parlamana Îsraîlê (kinsê) de pêk bîne.

Aliyê din yê hevlendiya Kadîma - Natanyaho

Kinêst (Parlamana Îsraîlê) xwediyê 120 korsiyên e û partiya Kadîma xwediyê 28 endaman. Lîkod 27 korsî, Îsraîl Bîtna 15 kursî, Partiya şas 11 kursî, partiya hevlabend ên Tewrat û Yehûdiyet jî xwediyê 5 kursiyên e bi hinek partiyên biçûk re. Niha mezintirîn partiya rexnegir û rikeberê hikûmetê li Kinêstê de hizba Karker e ku tenê 7 kursî hene. Bi hevlendiya nû re sercem 94 kursî li Kinêstê de piştewanê hikûmeta hevlendî in bi rêberiya Natanyaho.

Şaol Mofaz li dor vê hevlendiyê re dibêje: Ev firaksiyona 94 kesî li Kinsê de dikare zêdetir alîkariya Îsraîlê bike bona ber bi rûbûna bi girift û pirsên pêşerojê. Li hemberî vê îtilafê de Şilî Yakmovîç, seroka pratiya Karker serbarê rexneyên tûj ji vê hevlendiyê, ragihand ku tu kes Natanyaho û Mofaz bawer nake û hikûmeta nû bi hikûmeta herî tirsênok û radîkal li dîroka siyasî a Îsraîlê de da zanîn. Herweha da zanîn ku bi tevlihbûna Kadîmayê bi Hikûmetê re, jiyê opozîsyon bûn û rexneyên çewşekarane ji hikûmeta natanyaho derbas bû.

Ji aliyê din ve jî Tisîpî lîvni, wezîra karê derve ya berê û seroka berê ya

Partiya Kadîma'yê li rûpela xwe ya facebookê de eyan kir: dizanim ku we bi bihîstina nûçeya han çi hestek heye, lê we xatircem dikim ku eva dawîya rê nine û hêj riyên din jî hene.

Kabîneyek yekgirtî û şeranîtir li dijî Îranê

Natanyaho berî wê ku li hizra hîlbijartinek pêşwext yan hevlendiyek nû re be, dest bi jikar avêtina kesatî û moreyên rexnegire siyasetên hikûmetê kir.

Destpêkê de Moîr Dadgan, serokê berê yê Mosad'ê ku çendîn caran siyasetên derekî ên hikûmeta Natanyaho bi taybetî derheq Îranê rexne kiribû, ji kar avêt û li cihê wî de Tamîr Pardo, ku berevajî Dadgan, xwaziya êrîşa leşkirî li dijî Îranê ye destnîşan kir.

Herweha Natanyah, Gabî Eşkenazî, serokê sitada hevbeş a Artêşa Îsraîlê ku ji dijberên êrîşa leşkirî bû li dijî Îranê, xanenişîn kir û Yoaf Galant, fermanderê operasyonê Îsraîlê bi dijî "Xeze"yê li sala 2009'an xiste ciyê wî.

Renge wiha bê berçaw ku xurtbûna hevlendiyek weha dê bikare ji tundrewiyên hikûmeta Natanyaho kêmbike, lê bi nihêrînek kurt bi ser karnameya Şaol Mofaz re xuya dibe ku hevlendiya niha pêtir dişibe hevlendiyek dijî aştiyê bi Filistinîyan û nemaze şerxwaztir li dijî Îranê.

Çunku Şaol Mofaz ku li hikûmeta Ehod Olmêrt de wezîrê Berevaniya Îsraîlê bû, ji kesên yekem bû ku bas ji êrîşa ser Îranê kir. Niha pirsiyarek tê pêş ku ew kesên ku bi salan li astên herî bilind ên Îsraîlê de berpîrsatî hebûne û niha li hemberî siyasetên hikûmetê de bûne rexnegirên tund, çawane ku piraniya endamên Kinsê nasyonalistên tundrew yan mesebiyên radîkal pêk tîne? Çi bûye ku partiyên nermrew ên weke Karker îro rojê bi tenê 7 endam li Kinsê de hene li halekê ku partiyên tundajo pêkhînerê mezintirîn firaksiyonan li Kinsê de ne? Serbarê gefên li ser Îsraîlê bi taybetî ji hêla rejîma Îranê ve, lê wekî xuya Îsraîl jî tûşî nejadperestiyê bûye.

Jiyan di bin sîbera hikûmetên dîktator de



Ferşîd Neqşefken

Li welatên ku ji aliyê hikûmetên dîktator ve tî kontrolkirin, grûpên leşkerî, takekesên desthilatxwaz, kesayetiyên xwedî pile û bîrpirsiyariyên mezin û saziyên siyasî yê ku îdeolojiyên taybet hene, hewilê didin raman û xwestekên xwe li ser civatê û aliyên din ferz bikin. Ji bo gellek civatên cîhanê wek Kurdistana Îranê hêj mafên destpêkî yê mirovî di hemû warên jiyane û mafê beşdariya siyasî tî bînpêkirin û mîna tê xuyakirin di pêşerojê de jî û heta ev desthilata niha mabe, dê berdewam bî perçiqandin.

Di çarçoveya desthilatra pîrraniya hikûmetên dîktator de, kerameta mirovan tê bînpêkirin. Ev keramet pêk tê ji dabînkirina pêdiviyên maddî yê mirov û ji aliyê din jî pêkanîna atmosfereke siyasî ya takekesî ye ku bi nîrxandina wê qas ji nîfûsa cîhanê ku di rewşa siyasî ya dîktator de jiyane dikin, statuyek rastî li xwe digire.

Niha di hemû cîhanê 38 welat û 12 herêm hene ku di çarçoveya

desthilata wan de astengên xurt ên siyasî hene. Ji xeynê Herêma Kurdistanê ku niha bi awayekî federal birêve diçe, her 3 parçeyên din ên Kurdistanê di nav wan herêman de cîh girtine.

Ligel ku hejmara welatên azad di deshsalên dawî de zêde bûne û pêvajoyê pêşve çûye, lê ev guman û tîrsa herdem heye ku di encama wan guhertinên lezgîn û bîngêhîn de, hindêk ji van deverê û pêvajoyek berevajî demokrasîyê û azadiyên demokratîk bigirin pêşiya xwe û gellek corên nû yê dîktatoran tecrube bikin. Mîna şoreşa gelên Îranê ya sala 1979'an ku di vî welatî de pêk hat û d'encam de dewletek nû hat ser desthilatê ku di hemû beşên Îranê de mafên neteweyî hat bînpêkirin bi awayekî sîstematîk. Pêvajoya bîparkirina neteweyên ne Fars li Îranê awayek qanûnî li xwe girt ku mixabin pîrsgîrêka dîktatoriyeta kûr û bîngêhdar di vî welatî de pêşan dide.

Li pîrr welatan, xelk bo heyamê çendî dehsalan û heta sedsalan di bin sîbera desthilata hikûmetên zordar û stemkar ên navxweyî û biyanî de dihatin çewisandin. Xelk di çarçoveya van hikûmetan dihatin bîsaftin û sîmîlekirina sîstematîk. Ev bûne komên wisa ji hev cudakirî ku nekarin ji bo gihîştin bi armanceke hevbeş hev bigrin û yekîtiya xwe bîparêzin. Nekarîna baweriyê bi hev bînin yan bi planên xwe pêngavek erênî bavêjin, loma di rewşek wiha de xelk qels û lawaz dibe û bawerîya bi xwe hebûna xwe ji dest dide û hêz û şiyana

berxwedanê di nav îradeyê wan de ji nav diçe. Xelk bi qasekê hest bi xof û tîrsê dike ku nerazîbûn û nîfreta wan ji desthilata dîktatoriyê û hêviyên xwe bo azadiyê bînin ziman, heta li cem heval û xizmên xwe jî bide xuyakirin. Di vî rewşê de xelk rûbirûyê vî gumanê dibe ku ger bixwazin bi awayekî pratîkî li ser berxwedana giştî bîfikirin, ditirsin û dibêjin : « Gelo ma berxwedan feydeya wê heye ? »

Xelkek wisa tercîh dide ji dêlva peydakirina bersiva vî pîrsê, jiyana xwe bî armanç û bî dîtina pêşerojek geş û hêviyên çêkirina jiyane bextewerane û azad berdewam bike û bi derd û elemên vî rewşê bîjî. Her wek Charlez Stuart Parnel di sala 1879'an de, li civîna Îrlandiyê nerazî û gîrevgirtî li dijî kirêwergirtinên Îngîlistanê got : « Girêdayîbûn bi dewletê tu

feydeyek nîne, pêwîst e hûn bi îradeya xwe piştrast û girêdayî bin û li kêleka hev alîkariyê bidin hev, kesên ku jar û lawaz in piştgiriya bidin wan. Peywendiyek xurt di navbera hev de çê bikin, xwe organîze bikin û divê hûn serkevin, ji ber ku desthilata dîktator nikare bidome. »

Loma gelên ku li jêr desthilata hikûmetên dîktator de jiyane dikin, divê xurt û xwedî îrade bin û nabe rê û derfet ji dîktatoran re bî dayîn heta bi awayekî demdirêj desthilatê bigrin dest xwe. Ezmûnan nîşan daye ku hikûmetên dîktator ne xwedî temenk dirêj in, heta hikûmetên dîktator ên îroyîn pitir lawaz û qels in, pîrr hêsan e ku li ser xalên wan ên qels kar bî kirin û hêza dîktatoriyetê bî ji holê rakirin, ligel ku tenê rêçareya berdewamkirina desthilata xwe ya reş û tarî di serkut û qirkirinê de dibînin.



Bi 900 Milyon beşdaran,

facebook weke sêyemîn welatê herî mezin ê cîhanê hat nasandin

Tora înternetî ya Facebookê bi hebûna 900 Milyon şarûmendên xwe, kariye piştî welatên Çîn û Hindûstanê weke sêyem welatê herî mezin di cîhanê de xwe bide nîşandan.

Li gor serjimêriyan aliyê kêma nîva şarûmendên Facebookê, di rojê de carekê seredana vî tora civakî dikin, herweha li gor zaniyariyan jî pitir ji nîva karberên înternetê facebookê bikar tînin, û ji her heft deqeyên xwe de ku di rojê de înternetê bikar tînin, deqeyekê di nava facebookê de derbas dikin.

Amerîka weke beşdarê sereke di Facebookê de, xwediyê 169 milyon kesane ku di wê tora

civakî de beşdar in. Hindûstan bi 51 milyon kesane, Bîrîzîl bi 45 Milyon kesane, Mekzîk bi 20 Milyon kesane û Endonêzî bi 11 Milyon kesane li gor amaran di tora civakî a Facebookê de beşdar in.

Lê di welatê Rûsiyayê de taybet e, û torên din bi ser Facebookê de zal in, û herweha li welatê Çînê Facebook hatiye qedexa û bîlokekirin, û li welatên Japon, Koreya Bakûr, Vîyetnam û Lehîstanê de, li gor nûçeyan karberên torên din ên civakî ji Facebookê zaftir in.

Xala herî balkêş ew e ku dewlemendên herî ciwan ên cîhanê karîne li rîya facebookê bibin xwedî serwetên zaf, weke Mark Zakêr Bêrg û Dastên Mosko Wîtzê 28 salî, ku di facebookê de hevpar in.

Di facebookê de, di her rojekê de pitir ji



300 milyon wêne tînin belavkirin û pitir ji 488 milyon kes di rojê de bi mobil û dataya xwe, diçin nava welatê facebookê.

Ce'fer Hesenzade naskirî bi Ce'fer beg, kurê Ehmed, di sala 1327'an (1948) li herêma Armirdêya ser bi bajarê Banê hatiye dine, û piştî şoreşa gelên Îranê çeka pêşmergegatiyê hilgirtiyê, û heya niha jî di nav refên PDKÎ de xebat û tekoşînê dike.

Hevpeyvîn: Arif Velezî



Cefer Hesenzade bîrewerî û serpehatiyên xwe ên pêşmergegatiyê weha bi me re parve kirin:

"Di temenê zarokatiya xwe de, bi cotyarî û kasibiyê ve mijûl bûm heya temenê min gehiştê 18 saliyê, piştî wê ez çûm leşkeriyê. Di serdemê rejîma pasatîyê û di sala 1352'an de min leşkerî bidawî anî, û ez vegeryame mala xwe.


Min karê cotyarî û kasibiya xwe domand heya ku şoreşa gelên Îranê dest pêkir, û min jî weke gelek kesan hest bi kêma û kasî, û zulm û sîtema rejîma paşatîyê li ser netewa Kurd kir, lewma jî digel şehîd Îzet ku birayê hevjiina min bû, rolê xwe wek her kesî di şoreşa gelên Îranê de lîst.

Kak Cefer di doma axaftinên xwe de weha dibêje: "Min wê serdemê PDK Îranê bi başî nas nedikir û herweha şoreşa salên 46-47'an jî bi başî nedihat bîra min û heta rejîmê jî vê serdemê digot ku çekdarên şoreşa 46 - 47'an diz û çete ne. Piştî şoreşa gelên Îranê ku PDK Îranê dest bi xebata xwe kir, xizmek me bi navê Sofî Ehmed ku di şoreşa 46-47'an de beşdar bibû, beşdariya di nav refên PDK Îranê de weke rêya herî baş bo çareserîya doza gelê kurd û rizgariya ji zulm û zoriyê ji me re bas kir.

Piştê di cejna 25'ê Gelawêja sala 1358'an de, wek yekem car di kar û bar û cejna partiyê de ez beşdar bûm, piştî heyamekê ku Komîte li Kurdistan û bajarê Banê hatin avakirin, em sê çar kes bûn ku me bo yekem car navê xwe weke endamê PDK Îranê nivîsand. Di dû de piştî midehekê Sitada Muştêrek (nawenda hevpar) li bajarê Banê hat avakirin û min bi awayekî fermî weke pêşmergegê PDK Îranê, çek hilgirt û heya niha û heya roja ku dimirim, ez di xizmet partiya xwe ya xweştevî de me".

Ce'fer Beg derheq bidawî hatina şerê Îran û Îraqê jî weha ji

"Min di gundekî de pirsyara Caş û Pasdaran ji xelkê kir, di bersiva min de keçek hate pêş û got; tu ferqek di navbera we û pasdaran de tune!! min jê pirsî çima? Got jiber ku Dr. Qasimlo hertim dijî rêdînê bû, û niha piştî şehîd ketina wî, we rêdîn daniye".



Agirî re axivî: "Dema ku agirbesata navbera Îran û Îraqê hat ragehandin, kadr û pêşmerge nîgeran bûn. Encama agirbestê bû ev ku rejîma Îraqê givaşê bixe ser binke û baregehên me di Îraqê de. Piştî wê nûnerê me li Bexdayê wate Kak Xefûr Hemzeyî hat Qendîlê û got ku hikumeta Îraqê du meh ji me re diyarî kirine û ragehandiyê ku dibê hûn herne nava kempan de. Em sê kes çûn xizmet Dr. Qasimlo û me pirsyara vê rewşê jê kir, Dr. Qasimlo şokolat dan me û got; eva şiriniya bidawîhatina şerê Îran û Îraqê ye, û taliya wê jî ew e ku heya du salên din çî naqewime, lê piştî du sala wê asoyek ji kurdan re peyda bibe. Piştî du sala gotina Dr. Qasimlo rast derket û raperîna sala 1991'an li Kurdistanê Îraqê de pêk hat, û Kurd derbasî qonaxek nû ya jiyana siyasî ya xwe bûn. Ce'fer Beg ji Agiriyê re weha axavtina xwe domand: "Bîrewerîya herî nexweş di pêşmergegatiya min de ku tu caran li bîra min naçe, ew e ku sala 1368'an, em di navbera Bajarên Seqiz û Banê de mijûlî karê siyasî û rêxistinîya xwe bûn, ku xeber dane me ku Dr. Qasimlo şehîd kirin. Lê bîrewerîya xweş ku di temenê pêşmergegatiya min de rû daye, ew e ku piştî şehîdkirina Dr. Qasimlo, Melbenda du û hêza Arbaba bi hev re cewleyek ewlehî û siyasî li dewerên Bokan û Miyandoawê pêk anîn. Em li bajarê Bokanê ber bi gundekê çûn û di gond de min pirsyara Caş û Pasdaran ji xelkê kir, di bersiva min de keçek hate pêş û got; tu ferq û cudahî di navbera we û pasdar û çasan de tune, em pir nerehet bûn û min jê pirsî çime? Got jiber ku Dr. Qasimlo hertim dijî rêdînê bû, û niha piştî şehîd ketina wî, we jî rêdîn heye.

Piştî vegeriyana me bo binkeyên partiyê, seba axaftina wê keçê berpîrsên partiyê biryar dan ku her kesek rêdîna xwe netirase, wê ji partiyê bê derxistin. Lewra hemû kadr û pêşmergeyan rêdînên xwe lêden.



Seîd Meqrozî naskirî bi Seîd Hewramî, kurê Ce'fer, sala 1328'an li li gundê Dere Hecîc, ya ser bi bajarê Nodşê ji dayik bûye, û heya niha jî bi moralek bihêz xebata xwe li nav PDKÎ de didomîne.

Kak Seîd jî weke piraniya ciwan û xortên din ên kurd li Îranê, her di despêka nûciwaniya xwe de ji bo dabînkirina bijîva jiyana xwe û malbata xwe dest davêje cotyarî, Baxevanî û kesabeta ser sînoren Îraqê, paşan bo kar û kasibiyê rû li bajarên din ên Îranê weke bajarên Bender Ebas, Abadan, Tehran û ...hwd dike.

Seîd Hewramî ji Agiriyê re weha axivî: "Dema wê hatibû ku ez herim leşkeriyê, lê min hez nedikir ku ez xizmetê ji rejîma zalim ya paşatîyê re bikim, lewra heyamê pênc salan min her carekê ku dihatin min bigirin û bibin leşkeriyê, min 500 tûmenê wê demê weke bertîl dida wan, û heya heyamekê desta ji min dikişandin.

Dema min li bajarên cur bi cur ên Îranê de kar dikir û ez vedigeriyame Kurdistanê, min gelek hest bi paşveman û bêparkirina Kurdistanê li çav herêmên din ên Îranê dikir, ew xuyakirina cudahiyan ku di navbera Kurdistanê û herêmên di ên Îranê de hebûn, bûne despêkek ku ez bikevim hizra xebat li dijî zulm û zora rejîma hakim bi ser Kurdistanê de, û di Buhara sala 1358'an de, min program û peyrewa navxwe a PDKÎ dît, û min hêvî û armancên xwe têde dîtin, lewra bi awayek fermî di heman salê de ez bûm pêşmerge.

Kak Seîd dibêje di heyamê pitir ji 30 sal temenê pêşmergegatiya xwe de min gelek rojên nexweş, bi êş û xem dîtine, weke şehîd ketina du birayên xwe bi navên Ebdulrehman û Se'dulla û birayê hevjiina xwe, lê dibêje roja herî naxweş a jiyana min li Qendîlê bû, roja şehîdkirina rêberê navdare kurd, Dr. Qasimlo, ku di rastî de zirarek gelek mezin bû ku li cestayê partiya me û gelê kurd ket".


Kak Se'îd weke bîreweriyek xweş di temenê pêşmergegatiya xwe de dibêje ku li ciheke Qendîlê de bi navê Gewredê kongireya PDK Îranê pêk hat û ez jî weke çavdêrê kongirê li wir bûm, di roja duyem a kongirê de şehîd Dr. Qasimlo got ku ez we xatircem dikim ku tu caran gelê kurd û PDK Îranê di gel aşbetaliyê ber bi rû nabe, eva xeberek xweş bû, ku me bihîst.

Seîd Meqrozî: niha serdemê xwendin û şerê pênuşê ye, lewra xwendina xwe bi başî bidomînin



Herweha di sala 1361'an de, em bo me'muriyeta partiyê de çûn Şewecoyê, û li wir me daxwaza dîtina Dr. Qasimlo kir. Di dema hevdiîtinê de hevalan di gel Dr. Qasimlo axaftin kirin, û pirsyara û nêrînên xwe anîne ber bas, dema goviya min hat, Dr. Qasimlo got; kurê baş tu çî dixwazî? Min ji pirsyara dîplomasiya Partiyê di derveyî welat kir, lê Dr. Qasimlo hindekê mat ma, û paşan got ku heya niha kêma kesan pirsyarek han kiriye û ji min pirsî ku gelo xwendewariya te heye? Min got nexêr, û paşan bersiva pirsyara min bi xebata anîna pizîşkên biyanî bo çareserîya birîndarên şer û karkirin di nexweşxaneyên partiyê de da.

Birêz Seîd Hewramî di dawîya axaftina xwe de dibêje ku, piştî 33 sal xebat di refên PDK Îranê de bi heq dizanim ku daxwaza pêşveçûnê ji rêberîya partiya xwe bikim û herweha daxwaz ji xortên kurd dikim ku niha serdemê xwendin û şerê pênuşê ye, lewra xwendina xwe bi başî bidomînin û mafên xwe ên rewşa weke gelê blindest ê kurd bi başî binasin û destnîşan bikin, paşan di pêxema bidestveanîna wan armanc û mefên netewî, xebata pêwîst bikin.



Bajarê Urmîye



Bajarê Urmîye berê weke yek ji mezintirîn navendên zanistî û olî hatiye hesabandin, ku împatoriya Romê ji bo destpêregihîştina bi Azerexşê mezin, Azergeşeb û paytextê Havînî ê Sasaniyan çendîn caran li vî bajarî re derbas bûne. Bajarê Urmîye çendîn egît pêşkêşî gelê Kurd kirine ku bi nav û dengtirîne wan, Emîrxanê Biradost û Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Niho Şikak in.



Mecîd Cinîkanlû

Urmîye bajarekî Rojhilatê Kurdistanê ye. Rojavayê wê Bakûrê Kurdistanê ye û rojhilata wê, gola Urmîye ye. Başûra wê bajarê Şinoyê ye. Li herêmê de Kurd, Asûrî, Azerî û Ermenî jiyane dikin. Nifûsa Parêzgehê 2496320 Kes e, û rûberê wê 27059 KM û Nefûsa Bajarê Urmîye 825000 Kes e, û rûberê wê 5899 KM.

Bajarê Urmîye ji herêmên Dol, Geliyê Qasimlo, Mirgewer, Tîrgewer, Deşt, Soma, Biradost, Kinarberoj û Enzelê pêk hatiye.

Urmîye û wateya wê

Rûberê bajarê Urmîye qasî 5899 kîlometryan e, ku li Bakûra Rojava a Îranê û Rojhilata Kurdistanê hilketiye. Şaristana Urmîye ji bakûr ve tevî bajarê Selmas, ji Rojava ve tevî tevî Kurdistana Bakûr, ji Başûr ve tevî bajarê Şino û ji Rojhilata ve tevî gola Urmîye cîran e. Bajarê Urmîye ku rûberê wê qasî 42.7 kîlometryan e li kêleka gola Urmîye ye. Ji şûnwarên dîrokî ên bajarê Urmîye em dikarin qala wan çuwan bikin: Goy Tepe, Girê Hesênlû, Avahiya Mizgewta Camî'e, Kîlîsaya Nene Meryem, Aramgeha Gunbed, Îmamzade, Kela Bêrdûkê,

Kela Dimdim, Kela Simayîlaxayê yekem, Kela Simayîl axayê Şikak. Herweha gola Urmîye jî giringiyek taybet daye bajarê Urmîye. Gola Urmîye 4810 Kîlometra şargoşe ye. Zêdetir ji 120 giravên wê hene ku herî mezin girava Şahî (kebûdan) e. Li gorî çavkaniyên Evistayî navê bajarê Urmîye li destpêkê de Çîçest bûye ku piştê guherîn bi ser de hatiye û bûye Urmîye. Serbarê vê çendê hebûna Zerdeşt pêxemberê Îrana kevnar li Urmîye bi xwe ji sedemên girîngiya wê herêmê ye. Zerdeşt xwediyê du pirtûkan bi zimanê Kurdî bûye ku pirtûkên han li ser çermê Gamêşan hatiye nivîsandin. Herweha egera hebûna qebrê dayîka Zerdeşt li gundê Enbê li 25 kîlometrya bajarê Urmîye li herêma Tîrgewer bi xwe nîşanderê vê rastiyê ye. Hebûna navên Evistayî ên gundên herêmê weke

Mawane, Sîlvana, Dezgir û...hwd bi xwe nîşanderê nasnameya dîrokî û pîrozbûna wî bajarî ne. Li gorî hinek çavkaniyan Urmîye navek Siryanî ye, û tê wateya bajarê Avê.

Bajarê Urmîye berê weke yek ji mezintirîn navendên zanistî û olî hatiye hesabandin, ku împatoriya Romê ji bo destpêregihîştina bi Azerexşê mezin, Azergeşeb û paytextê Havînî ê Sasaniyan çendîn caran li vî bajarî re derbas bûne. Bajarê Urmîye çendîn egît pêşkêşî gelê Kurd kirine ku bi nav û dengtirîne wan, Emîrxanê Biradost û Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Niho Şikak in. Her çend ku Urmîye çendîn caran ketiye ber êrîş û talankirina neteweyên biyanî, lê hêj nasnameya xwe a

Kurdistanî parastiye û xebata xortên gelê Kurd ji bo azadiya wê ji çengên dagirkeran dê her berdewam be. Her çend ku li wî bajarê de du neteweyên serekî yên Kurd û Azerî dijîn, lê dîrok mezintirîn şahîdê Kurdistanbûna wî bajarî ye ku helbesta Dim Dim jê re hatiye gotin.

Hatina îla Efsar bo bajarê Urmîye û guherîna demografiya herêmê

Dûrxistina bi kom a bi hezaran malbatên îlên Kurdan ên herêma Urmîye, bo Xorasana Bakûr û piştî wê şikesta terajîdî a îlên Biradost û Mukrî û girtina kela Dim Dim û kuştina mezinên Kurdan û pareke zaf ji alîgirên Emîrxanê Biradost (Lepzêrîn) û tevkujiya îla Mukiryan, gişt bûne destpêkek bona guherîneke bîngêhîn di pêkhatiya akinciyên vê herêmê û di encam de guherîna demografiya herêmê bi qazancê nexweciyên vê herêma Kurdistanê.

Di encama van bûyeran û guherînan di warê aborî, civakî, siyasî, Kurdan ji bilî evê ku pareke zaf ji hêza xwe a mirovî û madî ji dest dan, di berhevdanê herêmê de jî wekî berê xwedîhêz neman û hêza desthilatdariyê jî ji dest dan ku pêştir di destê mezinên Kurdan de bû. Dema ku şah Ebas li ser text rûnişt, di şerê Bexdayê de ji cesuriya Efsaran, Şah Ebas ji hêza vê îlê agehdar bû, yek ji mezinên vê îlê bi navê Kelbelî xwest û navê Xan pê bexşî û ferman dayê ku îla ji hev belavbûyî a Efsar kom bike û wan bibe danê Urmîye di ciyê Kurdan de.

Kurd li Urmîye bi salane ku dijîn û niha bi derbasbûna zeman ev aloziyên berê namane, lê rejîma Îranê hertim dixwaze bi çêkirina pîrsgirêkan Kurd û Azeriyan berde cane hev. Lê bi zanîn û têgihîştina Kurdên welatparêz û Azeriyan rûnakbîr ev pîlan ser nagirin.

Kurdên Urmîye li bajêr de bi zehmet û xebata welatparêzan Enîstîtoyek bi navê Ehmedê xanî ava kirine, ku Karê çandî dike. Herwusa li derveyî Welat rêxistinek bi navê Civaka Astî û Pêşveçûna Kurdistanê (CAPK) ava kirine.



Sirgûn û Wêjeya Kurdî

Gelo qedera 30-40 melyon Kurd e, ku ta roja îro bê dewlet maye ?!

An qedera wî ye, ku çapemeniya wî di sirgûnê de avîsbûye û di sirgûnê de zaye ?!

Wek ku diyare, destpêka rojnamegeriya Kurdî bi rojnameya (Kurdistan: 1898) destpê dike.



Konê Reş

Ev rojname jî, li Stenbolê, di sirgûniyê de, avîsbûye û di sirgûniyê de li Misrê bajarê Qahîre zaye.

Wiha jî, çapxaneyê Kurdî. Ewa ku rehmêtî Hisîn Hiznî Mukeryanî di sala 1915 an de ji Almanya anî û li bajarê Helebê danî û pê kovar çapkirin. Ew jî di sirgûnê hat dîtin.

Doza çapemeniya Kurdî, (kovar, rojname, pirtûk û radyo...) hişyarkirin û belavkirina zanîne ye di nav gelê Kurd de. Hem jî rizgarkirina zimanê kurdî û rizgarkirina gelê Kurd e..

Roja îro, ji bo vê armancê; hişyarkirin, zanîn û azadiya gelê Kurd, bi dehan kovar û rojnameyên Kurdan li dervî sînorê Kurdistanê, di sirgûniyê de tene weşandin.

Gava em li dîroka Kurdan ya kevin û nû mêze bikin emê bibînin ku, ew kesên ku doza mafê gelê Kurd kirine û dikin, ji neçarî dîrî welatê xwe ketine, di welatê biyanîyan de jiyane û di wê biyanîyê de kar û xebat kirine. Rojname, kovar û pirtûk weşandine, ji ber ku di welat de ew delîve nedîtine ku bi zimanê dê û bavê xwe kovar û rojnameyan biweşînin; gava ku em başûrî Kurdistanê ji vê mijara xwe bidin alîkî. Ji ber ku dewletên welat dagir kirine tu carî ew delîve nedane Kurdan ku Kurd bi regekî berfireh û azad çapemeniya xwe biweşînin.

Ji ber vê yekê jî çapemeniya Kurdî di welat de maye paşketî û ya heyî jî di sirgûnê de pişkiyê û mezin bûye.

Di vir de ez dixwazim navê çend kovarên ku di sirgûnê de derketine û derdikevin ji xwendevanan re raxînim:

- Kurdistan a mak / Qahîre.
- Rojî Kurd, Jîn / Stenbol.
- Hawar, Ronahî / Şam.
- Stêr, Roja Nû / Beyrût.

Ji sala 1991'ê û bi vir de, careke din Stenbol bûye wek sala 1908'an û heyamê meşrûtiyê jî çapkirina kovar, rojname û pirtûkên kurdî re. Ji wan weşanan:

- Welat, Welatê Me, Azadiya Welat, Dengê Azadî, Ronahî, Medya Guneşî, Newroz, Deng, Rewşen, Zend, Nûbihar... Belê, li Ewrûpa jî bi taybetî piştî derbeya 1980'î, çapemeniya Kurdî li wê hêlê gelekî geşbûye, ji wê çapemeniyê:
- Kurdistan Press, Armanc, Hêlîn, Wan, Berbang, Nûdem, Çira, Dugir, Roja nû, Bîrnebûn li Swêdê.
- Hêvî û Kurmançî, li Fransa.
- Axîna Welat, li Rûsya.
- Riya Taze, li Yekîtiya Sovyêta berê û îro li Ermenistanê, Yerîvanê, rojnameya Riya Taze heye, Ji sala 1930'î ve û heta 1937'an û piştê jî ji sala 1955'an û heta roja îro.
- Têkoşer, Li Beljîka, kovara kurdî a sê mehî, 1979-1995 (Komela Têkoşer, Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka)
- Bultena sê mehî ya bi Kurdî, Fransî, Hollandî û Îngilîzî: 1989 – 1995 (Enstitûtya Kurdî ya Bruksêlê) ya ku dewama Têkoşer e, di weşîne.
- Bultena sê mehî ya van her çar zimanan: Kurdî, Fransî, Îngilîzî û hollendî, Buroya Kurdî ya Pêwendî û Agahdariyê Li Bruksêlê, Beljîka, diweşîne..
- Havîbûn, Hîwa û Avesta Kurd, li Almanya.
- Ala, li Holenda. Û hwd.

Her weha gelek kovar û rojnameyên Kurdî yê din li seranserî ewrûpa û Amerîka derdikevin. Hem jî, li Kurdistanê û dervî Kurdistanê bêtir ji 2000 malperên enternêti hene...

Mirov dikare bibêje, ku ji 80-90% ji çapemeniya Kurd li dervî welat derdikeve, gava em başûrî Kurdistanê jê derînin. Ew jî bi saya ronakbr, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd e; ewên ku ji neçarî derketine – wek ku me li jor jî nîşan kir – û di welatê biyanîyan de bi cî û war bûne, lê tu carî pêwendiyên wan ji welat û welatiyên wan nehatiye birîn; û wan lehengan di mercên çetin û dijwar de çapemeniya xwe gihandiyê hundirê welat, xelkên welat jî xwendiyê û dixwîne, hem jî peşdarî tê de kiriye ji rojnameya (Kurdistan) a dayik bigre û ta roja îro.

Lê li ser rola wê çapemeniyê, di hişyarbûna gelê Kurd de mirov dikare van xalan raxîne:

- 1- Bi saya rojnameya (Kurdistan:1898) ê, zimanê Kurdî bû zimanê xwendin û nivîsandinê, tevî ku Cizîrî, Xanî û Feqê Teyran helbestên xwe bi zimanê Kurdî danîbûn, lê ta wê hingê zimanê Kurdî nebibû zimanê nivîsandinê.
- 2- Bi saya kovara (Hawar: 1932)ê, alfabeya Kurdî ya latîni ji zimanê Kurdî re hat berhevkerin, roja îro piraniya Kurdan pê dinîvîsin.
- 3- Bi saya kovara (Rojî Kurd: 1913) ê, pexşana Kurdî serê xwe hilda û yekemîn çîroka Kurdî di vê kovarê de hat weşadin, ew jî bi pênuşa rehmêtî Fûat Temo bû.
- 4- Çapemeniya sirgûnê wek çirayeke geş bû, Kurdan xwe li dor danhev û bi rêka wê, gelê Kurd ji gelek nexweşî û nezaniyan rizgarbûn.
- 5- Çapemeniya sirgûnê, beşekî mezin ji zargotin û dîroka Kurdan parast, ku ew çapemenî nebûya, dibe ku gelek bûyerên dîrokî û zargotina gelêrî wînda bûba û şaş bihata nivîsandin.
- 6- Bi wateyeke din çapemeniya Kurdî gelek belge û dukoment ji wendabûnê parastin.
- 6- Bi saya çapemeniya Kurdî û kesên ku xwe di ber de westandin. dengê gelê Kurd û bindestiya gelê Kurd di Ewrûpa û Emerîka de belav bû.
- 7- Çapemeniya sirgûnê gaziyeke bû ji gelê Kurd re, ku çavê xwe li cihana zanyarî veke, li dûv zanînen nû di cihanê de bilive û serwest be.
- 8- Nexasim ji aliyê teknoloji ve û dawî ku gelê Kurd jî tevî karwanê gelan bibe, di şaristanîya mirovahiyê de.
- 8- Bi saya çapemeniya sirgûnê gelê Kurd di welatê xwe, de li berxwe da û ji desthilanîn neket.

Tevî ku dagirkeran divîbûn Kurdan asîmîle bikin û wan di nav xwe de bihelînin û nema bikin.. Her û her wê çapemeniyê hewil dida ku gelê Kurd dostaniyê bi gelên cîran re bike, nemaze yê bindest û azadîxwaz.

9- Çapemeniya sirgûnê di jî rêjîmên paşverû sekinî, çî Erebe, çî Faris û çî Tirk. Û doza biratiyê bi gelên van netewan re kir di jî desthilatderên stemkar û rêjîmên xwînmij û kedxwar.

10- Çapemeniya sirgûnê roleke giring dilîze di aşkerkirina zilm û zor û hovîtiya ku li ser gelê Kurd tête meşandin...

Di dawîya vê kurtegotarê de dixwazim bibêjim ku kovar û rojnameyên Kurdî yê sirgûnê roleke mezin listine di hişyarkirina hestên netewî de, ne tenê li dervî welat, belê di hundirê welat de jî, ji ber ku rojnamevan û nivîskarê Kurd ta bi siyasetmedarê Kurd nikarîbû û nikarin xwe ji welat bi dûr bixin.

Tevî ku li dervî welat dijîn jî, lê hiş û ramanên wan bi ser welat û welatiyên wan ve ye, ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ku ew ji welatê xwe nehatine cudakirin û ji ber ku nehatine cudakirin, tev nivîsandin û afirandinên wan li ser welat û welatiyên wan in.

Ma wê çilo rola wan di hişyarkirina gelê wan de ne berz û mezin be û karê wan ne cihê pesin û spasiyê be ?

Sed silav li giyanê wan rojnamevanên Kurd be, ewên ku ji sifir destpêkirin û bingehê rojnamevaniya Kurdî ji me re danîn ku îro bi saya wê xebat û bizava wan em jî wek gelê cihanê xwedî çapemenî in e.

Kaniya helbestan



Xatirê te...

*Ji bo evîna me ez vê helbesta dawî dinivîsim
Ez dixwazim bi vê helbestê te bîr bikim*

*Dibêjin ku tu dibî rêwî
Bê gûman ez ê jî bibim sêwî*

*Dixwazim çend hêsrên çavan birîjînim
Mixabin nikarim bigrîm*

*Li min wisa nenêre
Mesekine here
Êdî ne jî min hez bike ne jî min bifikire*

Tu dizanî...

*Wateye evîne te bi min da fêh kirin
Bi gotinekî te reng da jiyana min*

*Niha jî tu diçî
Lê bizanibe! Ez dibim nivkuştî*

Tu dizanî...

*Dilê min ji min xeyidiye
Ji bo te deriyê xwe vekiriyê
Xuya dike ku bi hêvî ye*

*Ez newêrim jêre rastiye bêjim
Ji ber ku ez dilê xwe nasdikim*

*Bila fêh neke ku êdî tu jê hez nakî
Ji xwe bê hebûna te xwîn vedirşe*

*Naxwazim dilê min bibihîse
Ji ber ku ji wendabûna te pîrr ditirse*

*Bizanibe ku...
Min ji te hezkir
Ez jî te hez dikim
Ez ê jî te hez bikim*

Xatirê te...

Agirî

Duheftinametek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi

Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com

agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



Urmia, devera Mirgewer,
gundê Çiryawa


“Rûyê min yê hatî dizîn”

Perde li ser cinayetek rejîmê hilda

**20 hezar ceza ji bo kesên ku seyan
siwarî tirombêlên xwe dikin!!!**



Fermanderê
hêza Întizamî a
Îranê, serdar
Îsmail Ehmedî
Moqedem
ragihand: Yên
ku Seyan
siwarê
tirombêlên
xwe bikin, wê
bi tundî bîn
cezakerin.
Cezaya han 20
hezar tûmenî ji
xwe digre.



Nida Aqa Soltan ku hate kuştin û Nida Soltanî jî ku heya niha zindî ye, her niha jî di rojevê de ne. Her du jî girêdayî bûyerekî ne, ku vedigere bo xwenîşandanên sala 1388 a Rojî li Îranê de.

Dema ku Nida Aqa Soltan li meşên nerazîbûnê li sala 2009'an li Tehranê de hate kuştin, wêneyên Nida Soltanî li medyayan de hate bilavkirin. Rejîma Îranê jî dixwest bi hevpeyvîna di gel endamên malbata Nida Soltanî û bilavkirina wêneyên wê, nûçeya kuştina Nida Aqa Soltan direv derxîne.

Nida Soltanî ku niha li derveyî welat dijî, derbarê vê bûyerê di pirtûka xwe de weha dibêje:

“Li sala 2009'an dema ku nûçeya kuştina min di gel wêneyên min yê Facebookê li piraniya ragehandinên cîhanê de bilav bû, ez mat û heyrîmayî mam, jiber ku di şevê de ez bûme berjeng û sembola şoreşê. Di demê de ku tu rolê min li wan meşên nerazîbûnê de tunebû. Piştî vê ku hêzên rejîmê gef li min xwarin ku ez hevpeyvînê bi medyayên wan re pêk bînim, li sala 2010'an de min xwe gihande welatê Alman û li wir min daxwaza penaberiyê kir. Wêneyê min zêdetir ji salekê di cihê wêneyê Nida Aqa Soltan hate bilavkirin, lewra min navê pirtûka xwe danî “Rûyê min yê hatî dizîn”.

Ew pirtûk roja 16'ê Gulanê kete bazarê û dengvedanekî zaf hebû û rojnameya Birîtanyayî ya Taymz jî hevpeyvînek pêre pêk anî.

